



Ji serweriya
neteweyî ve heya
kolonîbûnê

»»» R:5



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duhestînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (320) 19-02-2018 Buha (1000) Tûmen

Netanyaho: Em nahêlin Îran kindirê îdamê bixe stûyê me

Netanyaho bi nîşandana qeteke (perçeyeke) balafira pêger ya têkşikayî a Îranê rû li Zerîf di konferansa Monîxê de jê pirsî, Gelo hûn vê yekê nas dikin? dibe ku hûn nas bikin. Ew ya we ye.



Netanyaho herwisa rejîma Îranê wekî gefa herî mezin ya di cihanê de da zanîn, û ragehand ku ew gellek rengê Naziyan didin.

Serokwezîrê Îsraîlê herwisa got ku hekî ew hewce bizanin, ewê bi kiryar li dijî rejîma Îranê helwestê bigrin. Netanyaho ragehand ku ew kiryarên zêdexwazane yên rejîma Îranê bûne sedema vê ku Îsraîl û Felestin nekarin bigihîjin aştiyê.

Arteşa Îsraîlê roja Şemiyê 21-ê Rêbendanê firokeyeke pêger ya Îranê hinda esmanê xwe kiribû armanc. Firokeyên Îsraîlê piştê sîstema kontrolê ya rejîma Îranê di Sûriyê de bombebarran kiribûn.

Balafireke Îsraîlê di dema bombebarankirina vî cihî de bibû armanca mûşekên Sûriyê û ketibû xwar.

Balafirên Îsraîlê heya niha

çendîn carî êrişî ser binkeyên Spaha Pasdaran kirine. Hêjayî basê ye ku piştî hingavtina balafireke pêger ya Îranê ji aliyê Îsraîlê ve, û piştê jî êrişa balafirên şerî ên Îsraîlê li ser gellek armancan di nava xaka Sûriyê de, berdevkê dewleta Almaniyayê siyaseta dijî Îsraîlî ya Îranê di Sûriyê de, wekî siyaseteke êrişkarane bi nav kir.

Berdevkê dewleta Almaniyayê “İştîfan Zaybirt” li dijî kiryarên bi geşbûna tundûtîjiyên di navbera Îran û Îsraîlê di Sûriyê de ragehand, ku ew siyaseta Îranê dibe sedema geşkirina agirê şerê navxweyî di Sûriyê de. Berdevkê dewleta Almaniyayê herwisa siyaseta rejîma Îranê di Lubnanê de jî rexne kir.

Li dijî kiryarên bi pêkana balafira sîxoriyê ya rejîma Îranê ji aliyê Îsraîlê ve, Elî

Şemxanî sekreterê Konseya Bilind ya Ewlehiya Neteweyî ya Îranê, pêkana vê balefirê ret kiribû.

Li gora gotina berpirsên Îsraîlî ji sala 1982'an şûnda eva yekem car e ku balafireke şerî a Îsraîlê di dema encamdayîna operasyonê de di nav welatekî Erebî de tê hingavtin. Rojnameya “Di sait” a Almaniyayê ji zimanê berpirsên Îsraîlî ve nivîsand ku dîplomatên Almanî, Firansî, û Birîtanî peyamên hişyarîdanê yên Îsraîlê gehandin dewleta Rûhanî, lê diyarîkirina siyasatên herêmî ên Îranê di destên serkomar de nine, belku rêberê rejîmê ye ku di vê derheqê de biryarê dide.

Li gora rojnameya “Di sait” a Almanî dewlet û arteşa Îsraîlê ser vê baweriyê ne ku şerê Îran û Îsraîlê wê her rû bide, lê tenê dema destpêkirina vî şerî ne xuya ye.



Dewletên rojavayî û Efrîn

»»» R:6



Pirsa referandomê

»»» R:2

Dewreya 228 a destpêkî a pêşmergegiyê bi dawî hat

»»» R:2



Romana Qurbaniyên Gune-hkariyê bi zimanê Kurdî derket

»»» R:10

Heysem Hisên

Qurbaniyên Gune-hkariyê



Wergera ji Erebî: Xalid Cemil MIHAMED

161 Roman

Sergotar**Pirsa referandomê****N: Kerîm Perwîz**

Rojên borî dem û wextên hestiyar ê temenê Komara Îslamiya Îranê derdixist. Di van rojan de û piştî serhildana xelkê bêzabûyî yê raserî Îranê, û piştî serkut û tundûtîjiya ji qasê zêde di hemberî vî xelkê nerazî de, dema axaftina seranên rejîmê bû ku eşkere bike ka gelo di serkutkirina xelkê de karîne bigihîjin asta serkevtina dilxwaz ya rejîma stemkar a xwe yan na?

Herçend ku Xamineyî û فرماندهی سپاه ragehandin ku şer û ajawe û têkdan bi dawî hat. ! lê gellek nekêşa ku kêşeyên wan ên kûrtir derketin, û Ehmedîniyad mohreyê destçêkirî ê Xamineyî li ber çavê cihanê deshilat qezayî û rêberê rejîmê bire jêr pirsyar, û Ruhanî mohrê emniyetî ê dilxwazê Xamineyî jî ragehand ku dibe qiseyên xelkê bibihîzin, hekî ne, çarenivîsa şah li ser rîya deshildar wate Xamineyî ye, û piştî jî di civînekê de basê giştîpirsiyê anî gorê. Ew gotinên seranên rejîmê, hekî em li rex gotinên Cenetî Şorayê Nîgehban danên, nîşana vê ye ku rejîma Komara Îslamî hest bi dema mergê xwe kiriye, û li pey deriyê dirêjkirina temenê biyom ê rejîmê digerin.

Cuda ji Rûhanî kesên din jî bi çend dîtingehên cuda bas ji referandomê kirine, ku niha bûye bas di nava kom û civînên siyasiyan di Îranê û li derveyî Îranê de. Ew referandom ku Rûhanî bas dike di çarçoveya yasayên Komara Îslamî de ye, û herçend bixwe baskirina ji referandomê nîşan dide ku serkomarê rejîmê jî ji dugmbûn û çeqîna rejîmê di nav qofiya kirîzên destçêkiriyên xwe de kiriye, lê ew referandoma wî, bo zexta siyasî û bo band û girûpên din, û poanwergitin ji wan û cardin xwelîkirina di nav çavên xelkê de ye. Jiber ku derevbûna hemû qewl û sozan hatine selimandin.

Referandomek ku bi nav reformxwaz bas dîkin, bo guherîna hinek xalan di yasaya bingeîn ya Komara

Dewreya 228 a destpêkî a pêşmergeyê bi dawî hat

Rêûresma bidawîhatina devra despêkî ya pêşmergeyê, li ser çiyayên Kurdistanê hate lidarxistin.

Li gora nûçeya gihîştî malpera “Kurdistanmedia”yê,roja Pêncşemî 26`ê Rêbendana 1396`an, di rêûresmeke taybet de, destyek ji keç û xortên jêhatî yên Kurd piştî tewawkirina devrên taybet yên siyasî û nizamî, çeka berevanîkirin ji kerameta neteweya xwe avêtin milên xwe.

Nûçegihanê “Kurdistanmedia”yê, di vê derheqê de ragehandiye ku: Ev rêûresma bi xwendina sirûda neteweyî a “Ey Reqîb”, û ragirtina deqeyek bêdengî ji bo rêzgirtin ji riha pak a şehîdên Kurd û Kurdistanê dest pê kir.



Piştî encamdana çend nimayêşên leşkerî ji aliyê pêşmergeyê beşdar di vê devrê de, ev rêûresma bi amadebûna çend endamên rêberiya hizbê û beşek ji pêşmergeyê Hêza Taybet li ser çiyayên Kurdistanê, bi rê ve çû. “Rohank Fathî” cihgira Komîteya Navendî a PDKÎ di vê rêûrsmê de axivî.

Navbirî di destpêka axaftina xwe de, tevî pîrozbahîkirina devrê ji kesên beşdar re, bas ji kesayetiya bilind ya pêşmergebûn û taybetmendiyên wê kir, û ragehand: Pêşmerge miroveke xwedî îrade ye, çimku li hemberî dijwarî û evraz û nişîvên li ser rîya xebatê xwe natewîne, û beravajiyê wan dijwariyan, bihêztir dibe, heriwsa îradeyeke ku neyarên gelê Kurd jê çavtirsî bûne. Di beşeke din a axaftinê xwe de got ku: Neyarên gelê Kurd gellek hewl dane da ku, pêşmerge weke kesekî şerxwaz û têkder di nav xelkê de bidin naskirin, lê cewhera şoreşgerîbûnê û bîrûbaweriya demokratîk a pêşmerge, ev hewl û xeyalên neyarên gelê Kurd betal kiriye.

Herwisa got ku, bi sebeba wan guherînkariyên ku di deverê û bi taybet di Îranê de çê bûne, xebata gelê Kurd ji bo rizgarî û azadiyê, pê daniye nava qonaxê nû de, û zêdetir ji her demekê pêwîstî bi hevxebatî û bihêzkirina ruha bilind ya neteweyî heye.

Îslamî de ye, û di ratsî de li jêr navê parastin û ragirtina rejîma Îranê de dixwazin ku

rejîma Komara Îslamî bi rûçîkek xapînoktir ve bimîne.

Referandomeke din ku cihê jêhûrbûna zêdetir e, hinek ji girûp û hizb û çalakên siyasî li dijî Komara Îslamî bas ji referandomê bo diyarîkirina sistema rejîmê dîkin ku tê wateya derbazbûna ji Komara Îslamî, lê dixwazin ku bi daxwaziyeke bi berçav îroyîn û demokratîk vê rejîmê biguherin, bo rejîmeke din.

Di vî warî de çend tişt cihê pê li ser dagirtin, û rawestiyana zêdetir in, ku ew jî ew in ku ger rejîma Îranê, ku rejîmeke dîktator e, gelo kî vê referandomê wê bi rê ve bibe, ku diruşm jê re tê dayîn? Xwe piroseya birêvebirina referandomê hewcehî bi dehan hezra pîronel û heyameke zemanî ya piropagendeya aliyan bo bîr û raya xwe û ...hwd heye, ew deshilat ku vê rewşa paqij û demokratîk amade bike bo referandomeke weha, ku encama wê jî nehê dizîn û têde tezwîran neke kîjan dehslat e?

Pirseke girîng a din ew e ku li dema berdewamiya Komara Îslam bi hemû hêz û şiyana leşkerî ya dezgehên xwe ên serkutkar gelo kî tezmîna emniyetî ya dengderan, û herwisa bangewazkerên rejîmeke nû dike:?

Ji wan jî girîngtir ew e ku gelo biryar ew e ku dîroka çewtekarî û talankirin û xwelî li çavkirinê dubare bibe.? Di hemû cihanê de piştî her şoreşekê di sistemeke nû de ku cihê rejîma pêşîn digre, di pêş de, yasaya bingeîn û çarçoveya giştî ya çawaniya pêkvejiyana xelkê û gelên welat tê nivîsandin, û ew yasa dikeve nava dengdaneke giştî de, ne ew ku wekî Komara Îslamî ku referandomeke çewtekarane kirin ku gelo Komara Îslamî dixwazin yan na? Kesê nedizanî Komara Îslamî çî ye, da ku bixwazin yan na, û kes jî ew bijarde nexistibûn ber destan, ku gelo hekî Komara Îslamî nexwazin çî tişteke din heye?

Niha gelo biryar waye ku piştî nêzîk bi çil salan ji temenê biyom ê rejîma serkutkar û hov ya Komara Îslamî dubare heman fêlbaziyê peyrewê bikin, û bas ji referandomê bo navê rejîma bihê bê kirin, bêt vê ku bizanin di sistema bê de çendên din tene serkutkirin, û bi navê tiştên pîrozkirî ên din, bi dehan û bi sedan kesên din ji me dikujin û îdam dîkin?

Tenê refrandoma demokratîk û rastîn piştî rûxana Komara Îslamî û nivîsandina yasayeke bingeîn li ser bingeha pirsensîpên demokratîk û jiyana azad ya hemû neteweyên nava Îranê tê kirin, ku di vê referandomê de, ew yasa bikeve dengdanê, û bibe peymana pêkvejiyanê, nek emraza pîrozkirina şik û guman, û şemşîra kuştara xelkê.

Sêyemîn civîna “Navenda Hevkariya Partiyên Kurdistanî” bi rê ve çû

Sandeke PDKÎ di 3. emîn civîna “Navenda Hevkariya Partiyên Kurdistanî” de beşdarî kir.

Roja Sêşemiyê 17'ê Rêbendanê şandeke PDKÎ bi serperestiya Mihemednezîf Qadîrî endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ di 3. emn civîna “Navenda Hevkariya Partiyên Kurdistanî” de beşdarî kir, ku di binkeya serkirdayetiya Saziya Xebat a Kurdistanê Îranê de bi rê ve çû.

Di vê civînê de, tevî baskirina li ser

biryar û rasipardeyên civîna berê, pêdagirî li ser pîrensîp û xetên giştî ên hevkarîyê, û bi taybetî li ser pîrsa rûxana Komara Îslamiya Îranê, û dabînkirina demokrasiyê û mafên neteweyî di Kurdistanê Îranê de hate kirin.

Piştî guherîna bîrûrayan li ser tewerên giştî ên bernameya kar, û pêdagirî li ser hevkarî û hevahengiya bo navxwe ya Kurdistanê hate kirin, û pîrsa xwenîşandanên van dawiyane û rola berçav ya jinan bi girîngî ve bas jê hate kirin.

Di vê civînê de herwisa bas ji vê hate kirin, ku “Navenda Hevkariya Partiyên Kurdistanî” dibe hewl bihê dayîn, ku li gora wan pîrensîpên ku li ser wan li hev kirine, hêz û aliyên siyasî gazî bike, û ji nêz ve ji boçûn û dîtingehên wan agehdar bibin, herwisa li ser roja 21'ê Şibatê roja zimanê dayîkê kar û hevahengiya hewce bê encamdayîn.

Hevdem spas li wan hêz û aliyên siyasî hate kirin ku pîrozbahî ji bo navenda hevkarîyê şandibû, û amadeyî û hevkarîya xwe ragehandibû.

Piştî çendîn xal wekî bernameya kar û hindî zêdetir çalakîtkirina karên navendê hatin diyarîkirin, û bi pêkanîna presskonferansekê dawî bi civînê hat.

Siyasetvanekî naskirî ê Kurd ragehand ku Efrîn wê bibe Vîtnama Tirkîyê

Dengîr Mîr Mihemed Furat siyasetvanê naskirî ê Tirkîyê ragehand ku rege Tirkîye bikare Efrînê bi hêza xwe ya leşkerî dagîr bike, lê Efrîn wê ber xwe bide, û Tirkîye tu carî nikare dest bi ser de bigre û tê de bimîne.

Navbirî bas ji vê kiriye ku Efrîn wargehê nasyonalîzma Kurdî ye, û xanexwêyê bi hezaran Kurdî ye ku ji Tirkîyê li ber zulmê reviyane wir.

Furat li ser vê bawerîyê ye ku, jiber ku hilbijartinên herêmî, parlemanî û

serkomariyê di sala 2019'an de wê bi rê ve biçin, û bi baldan bi vê ku di hilbijartina referandoma ji bo guherîna yasaya bingehîn de Erdoxan dengê piraniyeke lawaz bi dest xist, niha bi vê êrîşa xwe dixwazin ku hesta netewexwazên alîgirê MHP'ê bi dest bixin.

Wî ragehand ku hikûmeta Tirkîyê Efrînê wekî beşeke veqetiyayî ji kantonên din dîzan e, ku bi rehetî wê bê girtin, lê berevajî ew yek ew qas rehet jî nine ku ew fikir lê dîkin.

Wî siyasetvanê Kurd ragehand ku hekî Tirkîye bikare bi hêza xwe ya leşkerî Efrînê dagîr bike, wê wekî destbiserdegirtina Vîtnamê ji aliyê Amerîkayê ve, rastî têkçûnê bihêt.

Hêjayî basê ye ku Dengîr Furat ji ber vê yekê di nava AKP de nema, ku bi gotina wî Erdoxan gotibû wî Kurdan ne ziman hene, ne jî welat. Li gora gotina navbirî AKP dibêje ku ew partiyekî lîberal demokrat e, lê kiryarên wê wisa nîşan nadin, û niha wekî dîktatoran tevdigere



Parlamentoya YE rewşa Efrînê gotûbêj kir

Efrîn bû mijara civîna parlamentoya YE, û pêşniyara diyarîkirina Efrînê wekî herêma dijîfirîn hate dayîn.

Berpirsa Siyaseta Derve ya YE “Federîca Mogherîni” di vê civînê de bal kişande ser zêdebûna binpêkirina mafên mirovan li Tirkîyeyê, û girtina rojnamevanan, dijberan û alîgirîya dadgeriyê.

Mogherîni destnîşan kir ku divê Tirkîye li şûna Kurdan, berê xwe bide rêxistinên terorê.

Piştî axaftina Mogherîni, bi dehan parlamenterên ji komên cuda mafê axaftinê girtin û hema bêjin hemû parlamenter li ber dagîrkirina Efrînê rabûn û xwestin, li dijî komkujiya sivîlan hewl bê dayin.

Ji Partiya Muhafizekar a Îngilîzê “Charles Tannock” destnîşan kir ku Tirkîye bi Erdoxan re ti carî nikare bikeve nava Yekîtiya Ewropayê

de, û nerazîbûn nîşan da ku şervanên Kurd ên li dijî DAÎŞ'ê têdikoşin, weke “terorîst” bêne binavkirin.

Ji Swîdê parlamenter “Bodil Valero” xwest ku çek bi Tirkîyê nehêne firotin.

Ew civîna di demekê de bû ku eva du roj bûn balafirên arteşa Tirkîyê di esmanê Efrînê de wekî rojên borî xûya nedikirin, û basa vê heye ku Rûsiyê piştî vê ku balafira wan ji aliyê opozisyona Sûriyê ve hate hingavtin û balafirvanê wan canê xwe ji dest da, hişdarî dabe Tirkîyê, ku nabe balafiran di şer de li dijî Efrînê bi kar bîne.



Herçend ku berdevkê hikûmeta Tirkîyê ret kir ku li ser gefên Rûsiyê biryareke weha hatibe girtin.

Ji aliyekî din ve biryar e ku Tîlirson serdana Tirkîyê bike û vê mijarê ku bûye sedema sarbûna pêwendiyên di navbera Tirkîye û Amerîkayê de gotûbêj bikin. Bi taybetî derheq hebûna hêzên Amerîkayî li Minbicê û piştigiriya wan ya lo-cistîkî ji Kurdên Rojavaya Kurdistanê.

Daxuyaniya Navenda Alîkariya Hizbên Kurdistanê Îranê derheq roja zimanê dayîkê

Kurdistanmedia: Li bereberê hatina roja cîhaniya zimanê dayîkê, Navenda Alîkariya Hizbên Kurdistanê Îranê daxuyaniyek weşand, û tê de daxwaz ji xelkê Kurdistanê Îranê kir ku bi her awayekî ku ji destê wan tê, di pêşwaziya roja cîhanî ya zimanê dayîkê de, bi awayekî yekgirtî û bi kiryar dengê xwe yê mafxwazane bilind bikin.

Deqa daxuyaniyê weha ye:

Daxuyaniya Navenda Alîkariya Hizbên Kurdistanê Îranê di pêşwaziya ji roja cîhanî ya zimanê dayîkê

Xelkê mafxwaz ê Kurdistanê!

Xortên hişyar ên gelê Kurd di Rojhilata Kurdistanê de!

Hogirno! û parêzer û berevankarên zimanê Kurdî di Îranê de!

Herwekî ku hûn dizanin 21'ê Şibate ya hemû salekê (îsal 2'ê Reşemê) di asta cîhanî de wekî roja zimanê dayîkê hatiye naskirin, û di nava gel û neteweyên cîhanê de bi awayên cur bi cur tê bibîranîn.

Mirov jîndareke nasnamexwaz e, û ziman di nîşandan û selimandina vê nasnameyê de pêgeheke taybetî heye. Ziman nîşana herî pirreng ya nasnameya mirov e. Mirov ji riya ziman ve, wateyê dibexşe jiyan û nasnameya xwe û derdorê. Zimanê dayîkê ne tenê zimanê axavtinê, belkû zimanê dilovanî, zimanê hest û bîrkirina mirovan e. Her van rastiyan jî wisa kiriye, ku navendên navdewletî ên bergirî ji mafê mirovan, girîngiyê bidin mafên pêwendidar bi ziman û bi taybetî parastin û vegeşandina zimanê dayîkê.

Beşek ji wan mafan, di pesendkirin û navdewletî yê wekî daxuyaniya cîhanî ya mafên mirov, rêkvevartin-nameyên navneteweyî ên mafên medenî û siyasî, konvansiyona nehêştina ferq û cudahîdanî di sîstema perwerde û hînkariyê de, konvansiyona mafên zarokan, konvansiyona navneteweyî ya vîdebirina her cure ferq û cudahiyeke nejadî, daxuyaniya mafê kêmaniyên mesebî, neteweyî, etnikî û zimanî û daxuyaiya



cîhanî ya mafên zimanî, reng dane, û pê li ser dagirtine.

Îran li rûyê pêkhateya zimanî, neteweyî û ayînî û kulturî ve welateke çend reng û çend neteweyî ye. Lê deshilatên yek li pey yekê ên Îranê bedela qebûlkirina hebûna van neteweyan û biferminasîna mafên wan, û yek ji wan qebûlkirina xwendina bi zimanê xwe, înkâr û serkutkirin û vêdedana vê zimanê kirine siyaseta xwe. Biferminasîna mafê xwendina bi zimanê dayîkê bo wan neteweyan, di biyavê derûnî, perwerde, kulturî û zimanî de bûye çavkaniya kêşeyên mezin û zirarên cubrannekirî. Berhevdan û xwendina îdeolojîk û siyasî ji aliyê deshilatdaran ve, ew maf ber bi aliyekî din ve biriye. Sîstemên şovenîst nasnameya xwe tevî zimanê serdest kirine, û wekî emirazekê ji bo serkutkirin û piştguhixistina zimanê neteweyên blindest ên Îranê bi kar aniye. Deshilatdar derheq mafê zimanî û mafên din ên pêkhateyên Îranê, komeke hêcet û hokaran tînin ku di bingehe de, jirêderxistina rastiya kêşeyê ye, bo mînak bikaranîna têgeha “kêmanî” û “hûrdeçandan”.

Bi tewahî eşkere ye ku koma kêmanîyan (neteweyên jêrdest) piraniya akinciyên vî welatî pêk tînin, di demekê de ku ji mafên herî destpêkî ên xwe bê par in. Ew têgehane li ser bingeha ferqdanî û biferminenasîna cudahiyan, û haşakirin ji mafên xwezayî û siyasî ên sercem pêkhateyên neteweyî û zimanî û ayînî ên vî welatî hatine

danîn. Eva jî rasterast dikeve çarçoveya serkuteke sîstematîk de, ku aliyekî yasayî pê hatiye dan.

Ji dîtingeha deshilatdaran ve, zimanê dayîkê jî gef e li ser berjewendiya neteweyî, yekparçeyiya xak û di heman demê de, hêcet e bona cudabûnê û serbixweyîxwaziyê. Lewra li ser vî bawewriyê ne ku ew têgehên fermî dibe stûnên serekî ên “şunasa resen” a Îranî bin.

Alîgirên siyaseta tekzimanî pêk tên ji wan kesayetî û rewî û aliyan ku tenê xala hevbeş ya wan, renga heman hewcehiya parastina pêgha pawanxwazane ya zimanê neteweyên serdest be. Eva di heman demê de, bûye sedema kêmgirtina zanist û edeb û kultura neteweyên din û bêbuhakirin û helandina wan. Pêşgirtina vî siyaseta di rastî de bingeha fikrî, siyasî û îdeolojiya deshilatdaran Îranê û pêvajoya bêdeshilat û hevberên wan bûye ji dirêjahiya dîrokê ve heya digihîje niha.

Ew cure dîtingeh û siyaseta, bi kiryar gurzeke metirsîdar e di pêkhateya çend rengî ya Îranê de, û metirsiya jinavçûn û piştguhixistina şunasa neteweyî ya neteweyên din e. Lê bêşiyânî û lawaziya pêkhateya sîstema siyasî di ber bi pêşvebirina rewta wekhevîxwazî û asîmilasiyona ferhengî û zimanî ji aliyekî ve, û hişyariya neteweyên bindest û bergirîkirina ji zimanê xwe sedema sernekevîna wê bûye. Ew îdî'aya ku biferminasîna zimanên

xeyrîfarsî dibe sedema bihêzbûna xwestek û hogiriya bi veqetiyana neteweyên xeyrîfars, zêdetir di bin bandora “teoriya totî'e” û cewherê qorixkirina deshilatê û dehsilatdaran de bûye. Eşkere ye ku sepandina zimanê maneke taybet dikeve nava çarçoveya zimankuştin û serkuteke sîstematîk bi tewahiya wateya xwe de. Di demekê de di vî serdemê de, bi dehan welatên cîhanê zêdetir ji yek zimanê fermî hene, sîstema perwerde û fêrkariya wan çend zimanî ye, û piraniya wan jî xwediyê sîstemeke siyasî ya cihgir û demokratîk in.

Em wekî neteweya Kurd jî, wekî neteweyeke xwedîçand û şaristanîyet, di derbazbûyî û heya niha jî, ku ziman û kultura me ji aliyê kultura zal û serdest ve metirsiya helandin û jinavçûnê li ser e, û wekî erkeke nîştimanî ya her takeke Kurd dizanin ku pîrsa zimanê dayîkê û parastina wê girîng e, daka vegeşandin û parastina wê bidin.

Bangewaza me:

Navenda Alîkariya Hizbên Kurdistanê Îranê tevî pîrozbahîya roja cîhanî ya zimanê dayîkê li neteweya Kurd û neteweyên din ên Îranê, bi rêz û hurmet ve, awiran li hewl û xebata dilsojane ya ronakbîran û mamostayan, nivîskaran, lêkolînavan û wêjevanên Kurd di Rojhilata Kurdistanê û navxwe ya Îranê dide, ku serbarê gefan û karşikêniya dem û dezgehên hikûmetî, ji parastina zimanê xwe, û xizmetkirin û vejîyandinê xafil nînin.

Ji serweriya neteweyî ve heya kolonîbûnê

N: Kejal Hacî Mîrzayî

Reftara sîstematîk ya hikûmetên yek li dû yekê ên Îranê digel neteweya Kurd di Rojhilata Kurdistanê de, ref-tarek bûye ku li ser bingeha dagîrkari-yê û îstî`imarê hatiye darêtin. Hekî em awirekê bidin dîrokê, ew rastiya ji me re eşkere dibe ku berî avanûna dewleta bi nav modern ya Kurd bi sedema hebûna mîrnişînên xwe ve xwediyê curek ji serweriya aborî û siyasî bûye. Heya radeyeke zor jî di birêvebrina aboriya Kurdistanê de serbixwe dûr ji ferq û cadahîdanîna navendê bûye. Avakirina Komara Kurdistanê jî yek ji wan qwonaxan e ku Kurd xwestek û îradeya xwe ya neteweyî bi ser xwe de hakim dike, û serbixweyiya rêjeyî ya xwe cihgir dike, lê çî di qonaxa berî dewleta bi nav modern û çî jî piştî avabûna vê dewletê bi derba êrîşa serbazî û dagîrkariya xak ew serweriya siyasî ya Kurd ji Kurdan hatiye standin, û hatiye bînpêkirin, ku di encam de di hemû warên jiyana siyasî û aborî û civakî û ferhengî de bi eşkere û bi awayekî cuda di navçeyên din refatr digel de hatiye kirin.

Siyaseta paşxistin û ferqdanîna siyasî û aborî û asimilasyona zimanî û kulturî ji taybetmendiyên pîlana van hikûmetên dagîrker bûn, ku li hem-berî vî gelî de hatiye kirin, û hebûna wan heya îro jî nîşana vê rastiye ne ku Kurd û Kurdistan di rewşa îsî`imariya navxweyî de henaseyê dikêşe. Têgeha Kolonyalîzmê

Astêr Hêmel pirofisorê Almanî li kitê-ba kolonyalîzm: “Dîtingeheke teorîk” bi vî rengî kolonyalîzmê pênase dike: “Bingehe kolonyalîzmê hebûna van koloniyên e ku bi şewazên curbicur di navçeyên din ên yek welatî de ji aliyê hikûmeteke dîktator ve bi rê ve diçe”. Ew bîrmend dibêje ku diyardeya kolonyalîzmê pêwendîya di navbera xelkê resen yên navçeyê yan welatekî ye digel piranî yan kêmaniyeke

derekî, ya êrîşkar. Di vê derheqê de her biryareke bîngehîn ku rasterast bandora xwe li ser biyavên jiyana xelkê Îstî`imarkirî hebe, ji aliyê dewleta dagîrker ve bi qazancê hikûmet û navendê tê derkirin.

Diyardeya kolonyalîzm ji dîtingeha dîrokzanan ve çar awayên bîngehîn hene,

ku di vir de hewl hatiye dayîn ku îşare bi yek ji wan wate îsyî`imara navxweyî bê kirin.

Çemka kolonyalîzma navxweyî bi wateya ne wekheviya pêkhatiya si-yasî û aborî ye ku di encama siyaseta zal de, di nabera navçe û bajarên cur bi cur de tê qadê. Wate di çar-çoveya sînorên vî welatî û li jêr siya vê ne wekheviyê de, neteweyek dibe hesteya zal, û neteweyên din dikevin bindestiyê de.

Koloniya navxweyî berhemhîner, xwedî û serçaweya serwet û sa-manekê ye ku ne tenê xelkê vê îzna tu cure mifahwergirtinek ji vê serwetê nine, belkû bi tewahî di berjewendiya navend û navçeyên derdorê wê, tê talankirin û dibe sedema asûdeyiya jiyana neteweya serdest, digel vê jî bi awayê yasayî û pîlan jêre darêti haşa ji hebûn û şunasa neteweyên bindest hem ji aliyê hikûmet û hem ji aliyê navendxwazan ve tê kirin, enacama vê cudahîdanîne dibe sazûna hêlêkeê di nava navçeyan de, ku bi awayê di-yar û eşkere ne tenê berçaviya fîzîkî



ya bajaran, ji hev cuda dike, belku di damezraweyên giştî de wekî sîstema perwerde û tendirustî, nexweşxane, û bendixane û sermaydanîn, û ber-hemên kulturî û reftara hêzn leşkerî û sîstema dad û dadperwerî û ...hwd, xwe nîşan dide, û herweha deshilata dagîrker bi hejmonîzekirina wêna û pênase û berjewendiyên xwe, ji riya sîstema siyasî û kulturî ve çemk û têgehên xwe heya berjewendiya giştî ya civaka dagîrkirî hildikêşe. Ew pênase û wêna piştî zalbûna cihgirbûna wan digîjin pêgeha awez ya tendurust, bi awayekî ku wekî gengaz a haşahilnegir guman tê de tunebe, û herwisa rewş jî wekî rewşekî xwezayî bê berçav.

Dr. Xalid Xeyatî mamostayê zankoyê di beşa zanistên siyasî li ser vê baweriyê ye ku Kurdistan welatekî kolonîlîzekirî ye. Ew bas ji îstî`imara navxweyî dike û dibêje ku Kurd wekî diyardeyeke siyasî di Rojhilata Kurdis-atnê de, di çî yek ji rûberên giştî de ku rasterast rûbereke civakî û aborî û siyasî û kulturî û berfirehiya pêwendî-

ya rojane ye, deshilata herî biçûk di dest de nine, ku wisa bû Kurd wekî sebebeke heûnê di Kurdistanê Rojhi-lat de diyardeyeke bi tewahî marjînal e, yanî li derveyî piroseya biryara siyasetê de ye.

Dr. Xalid di semînarekê de bona derx-istina vê rastiye bi belge ve îşareyê bi reftara rojane ya rejîma Îranê ji bo helandina şunasa Kurdî dike û pê li ser vê dadigre ku Kurdistan welatekî kolonîlîzekirî ye û hewce ye ku têgeheke giştî bo pênaseya Kêşeya Kurd were amadekirin, diyar e ku pêşniyar bo pênaseyeke nû û darêtina pîlaneke tejtîr ji bo vê pîrsê li derveyî şarezaiya hizrî û cesareta nivîskarê van çend xetan e, lê li gora wan bel-geyên dîrokî ku li ser hinek ji welatên rizgarbûyî ji destê kolonyalîzm-bi taybetî kolonyalîzma navxweyî- li ber dest e, digîjin vê encamê, ku rizgariya neteweyî û pêngavhilgirtina micid bona avakirina dewleta Kurd-istanê tenê riya çareserkirin û derba-zbûna ji vê kêşeyê ye ku dehan sale serweriya siyasî û kerameta mirovî ji vî gelî standiye.

Di pêşwaziya ji roja cîhanî ya zimanê dayîkê de bangewaza me ji bo hemû xortên gelê me di Rojhilata Kurdis-tanê de ew e: Roja cîhanî ya zimanê dayîkê bikin derfetek bona dengbil-indkirina li dijî serkutkirina zimanî û bînpêkirina mafên neteweyî ên Kurd û pêkhatiyên din ên Îranê. Birêve-berên rejîma Komara Îslamî nêzî

40 salan e heya li ser riya cîbicîbûna vê aliyê kêmkirî ji mafên zimanî ên

pêkhatiya Îranê jî, ku di yasaya bîngehîn de hatiye, bûne asteng û rêgir, û ew yek kirine hêvinê bangewaza mohreyên xwe di bi nav hilbijartinan de, û bi vî rengî bi şî`ûr û xwesteka vê pêkhatiya neteweyî û zimanî dilîzin.

Em daxwazê dikin ku di rojên bê de, û bi taybetî di roja cîhanî ya zimanê dayîkê de, bi armanca mehkûmkirina stem û serkutkirina zimanî û neteweyî

di Îranê de, û bilindragirtina ziman û şunasa neteweyî ya xwe bibin yek-parçe çalakî. Çavnihêriya me ew e ku di zankoyan, xwendingehan, îdar-eyan, binke û navendên kulturî, torên civakî, di van ragehandinên ku dengê we digihîje wan, bi ew qasê eşkereyî û bivêrane nerazîbûn, û bîzariya xwe ji siyasetên zimanî û neteweyî ên Komara Îslamî nîşan bidin. Daxwaza me ji tev çîn û texên civaka Kurdis-tanê, mamosta, dersxwan, xwendekar

û çalakên ferhengî û medenî ew e ku bi her awayekî ku ji dest wan tê, di pêşwaziya ji roja cîhanî ya zimanê dayîkê de, bi awayekî yekgirtî, û bi kiryar dengê xwe ên mafxwazane bilind bikin.

Bi hêviya hindî baştir birêveçûna roja zimanê dayîkê di Kurdistanê de Navenda Alîkariya Hizbên Kurdistanê Îranê

Dewletên rojavayî û Efrîn

N: Selaheddin Çelîk

Ew deyndarê Kurdan in. Di şikestina DAIŞê de para kurdan mezin e, mal û warê kurdan wêran bû, bi hezaran jiyana xwe ji dest dan. Bendewarî hesteke însanî ye.

DAIŞ di bin çavdêriya sîxuriya Tirk de, ser Tirkîyê ve belavî dinyayê bû. Dezgeh, îro jî li ser kar e. Tenê nav diguhere. Bîrdozî û siyaseta dewletê, tundrewiyê diçîne.

Dewletbûn dibe destûrmendiyek e. Binbariyên têkiliya dewletan, hene. Dewleta tirk, dê destûrmendiyê di bînpêkirina zagonên navneteweyî de bi kar tîne.

Bûyera Efrînê, ji pîrsa Kurd tê. Bîrtanya û Frensayê ew pîrs afirandin, Amerîka û Rûsyayê statuko parastin. Divê mirov navê pîrsê eşkere bêje, nexwe êş dê xwe dubare bike.

NATO dibe sedemê bêdengmayînê?

Ma ji endamtiya Tirkîyê tiştek maye? NATO li himber Sovyetan (Rûsyayê) damezrandibûn. Îro Enqere ji Brûkselê zêdetir, nêzî Moskovayê ye.

NATO (xwedêgiravî) parêzvanîya demokrasî û azadiyan dike. Tirkîyeya îro? Desthilata Tirk, neyartiya wan nirxan dike.

Em werin pîrsa “parastina sînoran”. Kî êrîşî Tirkîyê dike? Ne ti kes. Ew êrîşî herkesî dike, him jî li derveyî “sînorên xwe”. Li Başûrê Kurdistanê, li Rojavayê Kurdistanê çi karê leşkerên Tirk heye? Mijar Sûriye be, li seranserê tixûb têldirîk, mayîn, qereqol, kozîk hene, sîstema lazerê û elektronîk heye. Ev çend sal in, diwar jî tê avakirin.

Rastiyê bi zanebûn xelet dixwînin. Herdu aliyên tixûb, Kurdistan e. Sînor li ser koletiya Kurdan çêbûye. NATO tixûbên kolonyalist diparêze. Îro jî derewê bi dinyayê didin xwarin û herwiha rê ji nijadkujiyê re vedikin.

Pîrs, berjewendî ye. Di pişêsaaziya leşkerî û aboriya Tirkîyê de para wan heye. Mixabin ne jiyana Kurdan, lê ew berjewendî li pêş in.

Ji wan weye, ew dikarin Enqerê bînin qeyse berê. Berdêl jî, Kurd in. Divê mirov heqê vê tişta Erdogan bidê: Ew baş bi hevbendên xwe yê NATOyî dileyize.



“Operasyona sînordar”

Ev ji devê rayedarên NATO û YEyê Ewropayê nakeve. Çi ye ew? Êrîş, êrîşa dagirkeriyê ye. Êrîşî gelê Kurd dîkin. Artêşa Tirk, bi Cîhadîyên komkujer û nijadkujer re êrîş dike.

Dîsa jî ew çima hişyariya “sînordariyê” didinê? Haya wan jê hebû? Ma Enqere divê NATOyê ji êrîşa xwe agahdar neke? Serê 2018ê di serdana Erdogan a Parîsê de, ew mijar hat rojevê? Heke Enqerê sozê “operasyona sînordar” dabe wan, diyar e ku careke din ew wan dixapîne.

“Teror” dibe mehne?

Ew deq li PKKê dane. Herkesî pêve girê didin, herwiha deriyê her gunehkariyê vedikin. Lê dewleta netewekê dike, ma ti navî heq nake?

Ma ew destûrmendiya dewletan heye, ku deqa terorê li dijberê xwe bidin? Em bêjin yekê kir, çima yê din wê dişopînin?

Ma êdî çi wateya pîvanên navneteweyî ma ye? Herkes ji yê din re dibêje “terorîst”. Heya bêjî tevlihevî! Hizbullah Libnanê bo DYayê terorîst e, lê ew berdilê Tehranê û hevbendê Moskovayê ye.

Enqere bi Ewropayê dileyize. Dibêje, ew “êrîşî terorîstên PKK, PYD, YPG û DAIŞê” dike. Çima DAIŞ? Ma ew ne rêxistina te ye? Balkêş e, HSDya hevbendê DYayê (vêga) tevli nake. Enqere dikare her tiştî bêje, lê tê. Çima yê din?

Kî çi bêje bila bêje, ev eşkere ye: Dewleta bi sedemên nijadperestî êrîşî netewekê dike, navê terorîstiyê bi zêdeyî heq dike. Yê piştgirî didinê jî, ji şermezarkirina dîrokê nafilitin.

Ma Ewropa ne dara bin xwe dibire?

Ewropa hêlîna mafên sîvil e. Bi wê destûrmendiyê, destê xwe dirêjî eşên welatan dikir. Bêguman bi berjewendiyên emperyalîst re gêrekiyê. Dîsa jî ew hestiyarî, ji bo gelan hêvî û ewleyiyek bû.

Dinya guherîye. Bandora navêndên din zêde dibe. Bi taybetî Moskovayê, Enqere û Tehran, hinardeya nîrxên dijî demokrasî û mafên mirovan dîkin, him bi hêza çekan.

Ewropa çiqas diçe gava paş tavêje. Di bûyera Efrînê de ji berpirsiyariyê direve. Bertek heye, lê têrê nake. Rojhilata Navîn ji dest here, otokrasiyê

jixwe berê xwe daye Ewropayê. Li vir û wir, YE qereqolên xwe winda dike. Encameke din, baza nijadperestiyê ye. Ewropa nikare di rikeya cam de xwe biparêze. Efrîn ne bûyereke ji rêzê ye.

Du kongre

Li Soçî zîlamê Moskova, Enqere û Tehranê civiyan. Kurd tinebûn. PYD nexwestin, baş bu ku ew nexwestin. ENKS ji ber êrîşa Erfînê neçû, baş bû ku ew neçû. Biçûna jî, tiştek bi dest nedixistin. Ji wan platforman nan dernakeve.

Yek destkeftiya kurdan çêbû: Li ber yekîtiyê mehne neman.

Kongreya CHPê çêbû. Min li encamnameyê nêrî. Bo Kurdan ev digot: “Pîrsa kurd, li ser bingeha hemwelatiya wekhev û di çarçoveya yekîtiya neteweyî û lihevkarîna civakî de wê bê çareserkirin”.

Çîroka berê ya Kemalîst. Heke bi wê rê çareser bûbûya, çima wê ji 1920ê heya 2003yê we ew çareser nekir?

Kurd gellek xeletiyên dîkin, lê tiştek rast kirin; ji CHPê dûr dimînin. Ji bêhişên evîndarê kujerê xwe, jixwe ez bêhêvî me.

Nerîna Lîderan



Jim Mattis: “Îran sebeka hemû pîrsgîrêkên Rojhîlata Navîn e”.



Zaybirt: “Siyaseta Îranê di Sûriyê de dibe sedema geşkirina agirê şerê navxweyî di Sûriyê de”.



Nesrîn Ebdulla: “Artêşa Turkiyê gaza Sarînê li dijî Efrînê bi kar tîne”.



Rûhanî: “Em jî daxwaza referandomê dikin!!”.

Kebûdwend: Dibe Erdoxan bi tawana şer û cinayetên dijî mirovahiye bê dadgehkirin

Mihemedsidîq Kebûdwend çalakvanê mafê mirovan û avakerê Saziya Berevankar a Mafê Mirovan a Kurdistanê, di daxuyaniyekê de, rexne ji vêjdanên razayî yên cihanê girtiye û gotiye ku çima wan li hemberî êrîşên Dewleta Turkiyê yên ser bajarê Efrîn a Kurdistanê Sûriyê de bêdengî hilbijartine.


Avakerê Saziya Berevankar a Mafê Mirovan a Kurdistanê, ji xwedîvîjdanên daxwaz kir da ku dawiyê bi wê bêdengiya xwe li hemberî êrîşên dewleta Turkiyê yên ser bajarê Efrînê bînin.

Di beşeke din a vê daxuyaniyê de hatiye ku: Erdoxan desthilatdarê dewleta Turkiyê, di çend salên derbazbûyî de, bi perwerdekirin û şandina girûpên terorîstî yên weke DAÎŞ, “El-Nesir” û “El-Qa’ide” û herwiha hindek kirêgirtî û cinayetkarên ku ji ber cinayetên ku encam dane revîne, kom kirine û dubare ev terorîstane ji bo Rojavayê Kurdistanê û li jêr rêniwîniyên rasterast yên artêşa dagîrker a xwe de şandine, û oporasyona cinayetkarane a nû li dijî Kurd di welatê Sûriyê de dest pê kiriye.

Desthilatdarên xeyalbaf yên dewleta Turkiyê, bi komkirina girûpên weke :Girûpên “DAÎŞ”, “El-Nesir” û “El-Qa’ide” û herwiha hindek kirêgirtî û cinayetkarên ku ji ber cinayetên ku encam dane revîne, kom kirine û dubare ev terorîstane ji bo Rojavayê Kurdistanê û li jêr rêniwîniyên rasterast yên artêşa dagîrker a xwe de şandine, û oporasyona cinayetkarane a nû li dijî Kurd di welatê Sûriyê de dest pê kiriye.

Artêşa dagîrker a Erdoxan û girûpên terorîstî yên hevalbendên wî, di heyama 18 rojên derbazbûyî de, sedan kes û xelkên bêtawan û bê mal û hal a kantona Efrînê di xwînê de, sor kirine.

Mixabin xelkê Kurd bi sebeka nebûna piştevanekî fermî û navneteweyî di asta cihanî de, û nebûna nûneran di NY û herwiha nebûna dewleta xwe di Rojhîlata Navîn de, zêdeyî 100 salan e ku bûye êxsîrê hindek dewletên destnîşankirî û herwiha bûye qurbaniyê danûstandinên nedadperwerane di deverê û cihanê de .




Rejîma Îranê gefan li medyayên dijberî xwe dixwe

Rejîma Îslamî a Îranê, ji bo dirustkirina şerê derûnî, bi gefxwarinên li medyayên dijberî xwe ragehandiye ku, hewce ye kanalên girêdayî Sapaha Pasdaran bêne naskirin.

Li gora nûçeya gihîştî malpera “Kurdistanmedia”yê, heyameke ku rejîma axûndî bi armanca jinavbirina yekîtiyê û tebahiya di navbera xelkê Kurd de, dest bi çêkirina şerê derûnî, di torên civakî de kiriye, da ku bikare torên civakî bi qazanca xwe îdare bike.

Nûçegihanê malpera “Kurdistanmedia”yê bas ji vê yekê jî kiriye ku, bi zêdebûna kanalên Kurdî û bi belavkirina postêr û nivîsên çewt, dixwazin ku ev baweriya xelkê Kurdistanê ku ji dest dane, dubare bi dest ve bînin, lê ewa xeyaleke xav e di mejiyê çav û kirêgirtiyên rejîmê de, û bêguman xelkê Kurdistanê li hemberî wan kiryarên rejîmê de, bê helwêst namînin.

Nûçegihanê malpera “Kurdistanmedia”yê, di doma rapora xwe de bas ji vê jî kiriye ku, ji bo hemû hevvelatiyan eşkere û zelal e ku, kanalên bo mînak, “KurdPress”,



“Dengê Nîştîman”, “Ufuq Kurdistan”, “Kurd Today”, “Nasyonalizma Kurd”, “Şarekem Dîwandere”, “Axeîrî Xeber”, “Paygaha Xeberî a Hewall”, “Zirêbar Xeber”, “Rûdaw”, Şarekem Sine û Kurdnews”, dehan malperên din, hemû ji aliyê hin kesên girêdayî rejîmê ve tene birêvebirin.

Nûçegihanê malpera “Kurdistanmedia”yê, herwiha tekez jî kiriye ku, di heyama referandoma serbixweyiya Kurdistanê Başûr de, wan kanal û malperên girêdayî rejîma Îranê, bi awayê berdewam hewla dirustkirina şerê derûnî di torên civakî de dane, û dixwastin ku, rewşa siyasî a navxweyî Kurdistanê, bi qazanca xwe tewaw bikin.

Hevdem di çend rojên derbazbûyî de, qelemfiroşên girêdayî rejîmê, digel “Mihemedhusên Şahrûdî”, nûnerê weliyê Feqîh, di bajarê Sine de civîn pêk anîbûn, û bi fermî ragehandibûn, dibe li dijî medyayên dijberî rejîmê, bi taybet medyayên girêdayî Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, û Komelê bisekinin.

Roja “22`ê Behmen”ê jî xelkê li dijî Xamineyî diruşm dan

Herçend ku rejîma Îranê wekî hemû carê bi fîrt û fêl û xapandinan, û bi gefxwarina li hemû tex û qatên welat wate bizorê karî xelkekî bîne pêşberî kamêrayan, û wisa nîşan bide ku xelk pê re ne, lê dîsan jî di gellek ciyan de xelkê li dijî rejîm xwepêşandan kirin.

Roja borî di parka Milet a Meşhedê de, hinek ji ciwanên vî bajarî digel hêzên garda dijîşoreşê tûşî şer û pevçûnê bûn.

Di dema axavtina Rûhanî de jî, xelkê li dijî navbirî diruşm dan, û ew wekî derevker bi nav kirin, û di gellek nuqtayên Tehranê de diruşmên Mirin bo dîktator dan. Di Refsencanê de jî xelkê seba hebûna bêkarî û hejariyê li dijî rejîmê gellek diruşmên tund dan, û ew rejîm wek sebebkarê hebûna hejarî û bêkariyê bi nav kirin. Di rastî de deshilatdarên vê rejîmê dengê xelkê nerazî bihîstine, lewra jî ji tirsê herifîna sîstema xwe bi qewl û sozên derevîn dixwazin temenê xwe yê biyom dirêj bikin.

Berî 22`ê Behmenê Elem El-huda pêşnimêjê Meşhedê bo rakêşana xelkê bo nava meşa 22`ê Behmenê ragehandibû ku, li ser bingeha dersên Qur`anê dibe xelk di meşa 22`ê Behmenê de beşdariyê bikin.

Rohanî jî berdewam radigehîne ku kêşeya xelkê siyasî ye, û Xamineyî û banda wî tawanbar dike, û berevajî Xamineyî û banda wî jî kêşeya serekî ya xelkê kêşeya aborî didin nîşandan, û bi vî awayî xwe bêguneh nîşan didin. Ew jî didemekê de ku wêneyên wî di nava agirê kerb û kîna xelkê welat de dişewite, lê wî xwe kerr û kor kiriye û dengê xelkê nabihîse, û tenî wî xelkî wekî xelkê welat bi nav dike, ku li ber xwarina keyk û sandîsan di rêûresmên wan de beşdar dibin.



Nûçegihanekê bi sedema givaşên hêzên ewlehiyê yên rejîma Îranê, warê xwe bi cih hêla

Nûçegihana Ajansa Nûçegihaniya “Mukriyan”ê bi sedema givaşên hêzên ewlehiyê yên rejîma Îslamî a Îranê, neçar ma welat bi cih bihêle.

Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, di raporekê de belav kiriye ku, “Nîştîman Esedî” temen 33 salî û nûçegihana Ajansa “Mukriyan”ê, bi seba givaşên hêzên ewlekariyê yên rejîma Îranê, neçar ma da ku di yek ji welatên cîranê Îranê de akincî be.

Wê nûçegihana jin a Kurd di gotûbêja digel Ajansa “Kurdpa”yê de, tevî piştrastkirina vê nûçeyê da zanîn ku, ev çend caran bi seba çalakîyên medenî û nûçegihanî ji bo Îdareya Îtîla`ata bajarê Mehabadê hatibû gazîkirin, û cara dawiyê jî ev neçûye bo vê îdareyê, û ji ber givaşên Îtîla`atê neçar ma da ku welat bi cî bihêle.

“Nîştîman Esedî” herwisa gotiye

ku: “Wê berevajiyê dawxaza Îdareya Îtîla`ata bajarê Mehabadê, ji çûna vê îdareyê xwe parastiye, û hewisa tekez jî kiriye ku, wê bi bê destûra nivîskî a dadgehê nexwastiye serdana wê navenda hikûmetî bike”.

Îdareya Îtîla`atê di 5`ê Rêbenda 1396`an de, di pêwendiyekî telefonî de, ji bo cara duyem ji Nîştîman Esedî daxwaz kiribû da ku, bi armanca lêpîrsînê serdana wê Îdareyê bike,

lê Nîştîman Esedî jî berevajiyê wan, ew daxwaza wê navenda Ewlehiyê ya rejîmê red kiriye, û ji çûna bo vê Îdareyê xwe parastiye.

Nîştîman Esedî di bajarê Nexedê de hatiye dinê, û di bajarê Mehabada Rojhilata Kurdistanê de jî akincî bû, navbirî di warê mafê mirov û mafê jinan de çalak bû, û zêdeyî yek salî bû ku weke nûçegihana Ajansa Nûçegihaniya Mukriyanê çalakî encam didan.

Barên qaçax yên berpirsên rejîmê hatine giritin

Di sînoren bajarê Merîwanê de, du barên qaçax hatine giritin, û xwediyê wan barên qaçax jî berpirsên rejîmê ne.

Li gora nûçeya gihiştî malpera “Kurdistanmedia”yê, di sînore “Başmax” a girêdayî bajarê “Merîwan”ê, 5 kantînerên bar ji aliyê hêzên Îtîla`ata Sapaha Pasdaran a rejîmê ve hatine giritin, û du ji wan kantînerên bar yên “Mensûr Muradî” yê bi nav nûnerê bajarê Merîwanê di meclisa rejîmê de ne, û 3 barên din jî yên fermanderê hêza Întizamî a rejîmê, di bajarî Merîwanê ne.

Nûçegihanê “Kurdistanmedia”yê, di vê derheqê de êşkere kiriye ku, di hayamekî de ku, hemû sînoren kolberî yên bajarê Merîwanê hatine daxistin, û rê nadin da ku tu hatûçûnek di wan sînoran de bê encamdan, lê berpirsên rejîmê barên qaçax yên xwe di

wan sînoran de derbaz dikin. Ev kantînerane ji aliyê hêza Sapaha Pasdaran ve hatine giritin û heyanî niha jî zela nebûye ku di nava baran de çi bûye, lê zelale ku ev encama karê Spaha Pasdaran curek tolstandin ji wan du kesan bûye.

Hindek çalakvanê warê siyasî dibêjin ku, encama wê karê Sapaha Pasdaran piştî wê hatiye pêş ku, nûnerê rejîmê û fermandarê hêza Întizamî hazir nebûne da ku pişkek ji qazanca wan barên qaçax bidin bi Spaha Pasdaran, û ewan jî ji bo tolstandinê, dest bi ser wan baran de giritine. Berpirsên rejîma Îranê di sînoren Kurdistan de, bi encamdana karên qaçax û gendelî di gumeke de, zêdetirîn dahatê dest xwe dixin, û xelkê deverên sînorî jî di rewşa herî hejariyê de dijîn û neçar in bi kolberiyê û di rewşên herî xirab de, dahata jiyana xwe dabîn bikin.



Reportêra taybet ya NY ji bo karûbarên mafê mirovan a Îranê, çû ser dilovaniya xwe

Reportêra taybet ya NY ya bo karûbarên mafê mirovan a Îranê, bi sedema Ravestana dil di temenê 66 saliyê de çû ser dilovaniya xwe.

Li gora raporên medyayî yê Pakistanê, roja Yekşemî 22'ê Rêbendê, "Asme Cehangîr", di temenê 66 saliyê de bi sedema ravestana dil, di yek ji nexweşxaneyên bajarê "Lahur" a Pakistanê de, çû ser dilovaniya xwe.

Digel bidawîhatina devreya "Ehmed Şehîd" weke reporterê taybet yê mafê mirovan, "Asime Cehangîr" jî weke cihgira navbirî hatibû destnîşan kirin.

"Asime Cehangîr" di heyama salên 2004'an-2010'an de, weke reporterê mesebên azad û bîrûbaweriyên çalakî encam dane, û çend caran jî derheqê bînpêkirina mafên Behaiyan ji aliyê hikûmeta Îranê ve, rexne li vê hikûmetê giritibû.

"Asime Cehangîr" parêzereka bihêz a mafê mirov û çalaka lîberal di Pakistanê de bû, û navbirî yek ji rêberên "Tevgera Parêzeran" a welatê Pakistanê bû, û di heyama salên 1983'an-2007'an de, di girtîgehê de bûye.



Piraniya xelkê Îranê ji vê rejîmê bêzar in

Li gora lêkolîn û rapirsî-lyekê ku ji aliyê rejîmê bixwe ve hatiye kirin, %75 a beşdarên di vê rapirsîyê de ji rewşa aborî û siyasî di navxwe a Îranê de razî nînin.

Ew rapirsî ji aliyê navenda wergirtina bîrûrayên dersxwanên Îranê (ÎSPA) ve hatiye encamdan, û encama rapirsîyê di civîna navenda lêkolîna stratejîk a serkomariyê de bas jê hatiyekirin, ku di vê civînê de rawêjkarê serkomar û komeke aborîzan û civaknasan beşdar bûn.

Ew rapirsî di nava 4 hezar û 499 kesên serveyî temen 18 salî, û di 11 parêzgehên Îranê de hatiye encamdan, û derheq encam û zanyariyên vê rapirsîyê Mihemed Aqasî berpirsê ÎSPAYê ragehandiye ku nêzî 75 ji sedî a beşdarbûyiyan di vê rapirsîyê de ji rewşa jiyan û azadiya di Îranê de nerazî ne.

Wê navendê encama vê rapirsîyê derheq sedema hatina ser şeqaman û serhildanên nerazîbûnên xelkî ên Befranbara îsal bi vî awayî ragehandiye: %31 a beşdarên xwerisk, %69 di encama rewşa xirap ya aborî û bêkarî, %30 li ber gen-

deliya malî û îdarî, %20 .6 li ber nedadperweriyê, %13.5 li ser destêwerdan û plapiştîya rejîmê ji welatên wekî Sûriyê û Feleştîn û %9.7 li ser nebûna azadiya ramanê û %2.3 bi sedemên din".

Hêjayî basê ye ku li gora rapora rêkxirawa navdewletî û navendên parêzgarî ji demokrasîyê, rejîma Îranê di rîza rejîmên herî daxistî ên cîhanî de ye, û hemû navendên lêkolînê û herwisa Saziya Deng û Reng ya Îranê zanyariyan di berjewendiya vê rejîmê de belav dike.

Lê dema ku rapirsîya rejîmê bixwe bas ji vê dike ku %75 a xelkê ji vê rejîmê bêzar in, êdî bi baldana bi vê rastîyê ku di Îranê de neteweyên Kurd û Erebiyê Azerî û Tirkemen û Belûç ku piraniya nifûsa Îranê pêk tînin, rastî bêparîyeke zaf, û çewsandinê hatine û hekî rapirsîyeke azad yan referandome di bin çavdêriya NY de bi rê ve here, bi xatircemî ve piraniya xelkê dengê NA wê bidin vê rejîmê û hemû amar û zanyariyên çewt ên rejîmê wê eşkere bin.

Nesrîn Ebdullah: Artêşa Turkiyê gaza Sarîne li dijî Efrînê bi kar tîne

Berdevka fermî ya Yekîtiya Parastina Jinan li Rojavaya Kurdistanê, di civîna ku digel Parlemanter û rojnamevanên welatê Swîdê pêk anîbû îlan kir, ku Turkiyê di Efrînê de komkujîyê encam dide.

Berdevka fermî ya Yekîtiya Parastina Jinana, "Nesrîn Ebdullah", ragehand ku ev êrîşa Artêşa Turkiyê li dijî pîrensîpên navneteweyî ne, û got ku ev tometên dewleta Turkiyê hemû pûç û derev in, herwiha navbirî got, bila Turkiye destêverdanên Yekîtiya Parastina Gel di nav axa xwe de îsbast bike.

Navbirî got bajarê Efrînê cihê girûpên etnîkî û olî yê cûrbicûr e, û Efrîn stargehek e, û ji bo hemû xelkê Sûriyê jî sembola aştiyê bû, lê dewleta dagîrker a Turkiyê, ku yek ji endamê Saziya "NATO" yê ye, di 20 rojên derbazbûyî de li hemberî çavên hemû cîhan û bi çekên "NATO"yê êrîşê ser Efrînê kiriye.

Herwisa Nesrîn Ebdullah bas ji vê jî kir ku hindek belge hene ku nîşan didin, artêşa dagîrker a Turkiyê, di êrîşên xwe de, gaza Sarîne hatine bi kar anîye.

Navbirî herwisa zêde kir ku dewleta dagîrker a Turkiyê bo vê ku êrîşên ser Kurdan bike, bi avêtina rakêtan bo nav bajarên xwe yê weke "Kilis" û "Rêyhaniye" mahneyan ji bo êrîşên xwe dirust dike. Herwisa got ku hêzên dagîrker yê Turkiyê weke DAÎŞê, di Efrînê de cihên dîrokî, enbara ava wexwarina bajêr kirine armanca êrîşên xwe, heta xwendingeh û kiliseyên Mesîhiyan jî bombebaran dike. Di vê civîna çapemaniyê de, "WALTER MOTT" nûnerê partiya KesK û endamê komîsyona karûbarê derve yê Swîdê di parlamantoya wî welatî de, êrîşa artêşa Turkiyê bo ser bajarê Efrînê, wek bînpêkirina yasayên navneteweyî da zanîn, û pişevaniya xwe ji hêzên "YPG", û "YPJ" îlan kir û herwisa ji welatê Swîdê, û Yekîtiya Eropayê û Şevra Ewlehiyê a saziya NY daxwaz kir da ku li hemberî terorêzma dewleta Turkiyê bêdeng nemînin.

Hêjayî basê ye ku, hêzên YPG û hêzên YPJ duh du hêlikoptêrên Turkiyê xistin xwarê, û di van hêlikopteran de 11 kes hatin kuştin.

Çend leşkerên Tirkîyê jî di şer û pevçûnên di sînorên Tirkîyê de hatin kuştin.

Serbarê van hemû êrîşên duyem Hêza Natoyê, Hêsta jî Tirkîye tenê di çend gundên sînorî de kariye bê pêş, ku ew yek serkevtîneke gellek mezin e bo hêzên Rojavaya Kurdistanê û berxwedana wan cîhan heyrîmayî kiriye.



Romana Qurbaniyên Gunehkariyê bi zimanê Kurdî derket

Romana nivîsakarê Kurd Heysem Hisên, ku sala 2009an, bi Zimanê Erebî bi sernavê “Qurbaniyên Gunehkariyê”ji aliyê Weşanxaneya el-Tekwîn ve li Şama paytexta Sûriyê derket, destpêka sala 2018an li Amedê, ji aliyê Weşanxaneya J& J ve, bi Zimanê Kurdî jî derket.

Nivîskarê kurd Xalid Cemîl Mihemed, ev roman, bi sernavê Qurbaniyên Gunehkariyê ji Zimanê Erebî wergerandîye Zimanê Kurdî.

Wergera bi xwe “Girewên Gunehkariyê” ye, lê wergêr bi hevahengî ligel romanivîs, li şûna vê yekê Qurbaniyên Gunehkariyê hilbijart, ku ew sernavê wergerê be.


Romana Qurbaniyên Gunehkariyê behsa pirsgerêk û kêşeyên sînorê navbera Serxert (Bakurê Kurdistanê) û Binxetê (Rojavayê Kurdistanê) dike. Behsa rehendên wan ên siyasî, olî, hizrî û civak dike. Hejmarek ji kesayetiyên wê peyama romanê hildigirin û dibine serî. Hinek ji van kesayetiyên xwe neçar dîtin ku vî sînorî qebûl bikin. Hinekan jî ev sînor, bi hemû astegiyê wî, derbas ki, lê gelek kesan jiyana xwe li ser vî sînorî jidest da.

Di encama vê dabeşkirina cografî de, di navbera du parçeyên yek zeviyê de, dabeşûneke civakî hatibû dirustkirin. Li her aliyekî ji wê cografyaya dabeşkirî, li bakur û başûrê sînor, Kurd hatibûne dabeşkirin û vê rewşê berdeham kir. Di nav wan de, tîlên rêsayî, zeviyên mînan hebûn, ku di nav wan mînan de gelek kesan xwestin sînor derbas bikin, lê bi sedema teqîna mînan, jiyana xwe jidest da. Di nav wan de, dîrokek ji çîrokên bêdawî heye. Lê bi ser vê tevî de jî, roman nîşanê bi bûyer û hevpeymaniyên mezin dike, ku li ser serê wan hatine kirin. Bi taybetî ew kesên ku hatine piştguhkirin û perwîzkirin. Ew mirovên ku guhdan bi arezû, xewn, hêvî, êş û azarên wan nehate kirin, lê di encamê de, bandora vê rewşê tevî li ser jiyana wan dibû.

Di romana Qurbaniyên Gunehkariyê de, parçeyek ji zemîna berfireh, hatiye piştguhkirin. Ewqase bûyer û tevger li ser rûyê wê zeviyê pêk dihatin û pêk tên. Pîrejinek bi navê Xatûnê kesayetiya sereke ye, di romanê de. Xatûnê tevî herdu zarokên xwe, ji aliyekî sînor, berê xwe dide aliyekî din. Ji Serxetê diçe Binxetê, ji bo ku wan herdu zarokan ji gelek ziyanan biparêze.

Xatûnê bi dehên salan çîroka xwe ji her kesî vedişêre. Naxwaze dema bûrî bîne bîra xwe. Lê li mirinê, Xatûnê ji neviyê xwe re behsa çîroka koçberbûn û wexerbûna xwe ya ji neçarî dike. Xatûnê deriyê qonaxekê vedike, ew jî dîroka nîfşekî ji Kurdên dabeşbûyî ye, li ser du aliyên sînor. Di romanê de ew derî li ser gelek babet û wateyan vekirî dimîne.

Romanivîs Heysem Hisên 1978) li bajarê Amûdê yê Rojavayê Kurdistanê jidayîk bûye. Li bajarê Edinburgh, li Brîtanyayê bicih bûye. Damezrêner û rêveberê malpera “alriwaya.net” e. Endamê Komeleya Nivîskarên Brîtanî ye. Endamê Yaneya Pênûsa Skotlandî ye. Hejmarek ji berhemên wî yên weşandî hene, ji wan jî: Derziya Tirsê, Aram Tuxmê Êş û Azaran, (Giyayekî Ziyandar ji Buhîştê, Roman û Jiyan û Romanivîs li Daholên Cengê dide”. Rûdaw



Ferhenga Japonî – Kurdî derket

Ferhenga Japonî - Kurdî ku ji aliyê Komeleya Dostaniya Japonya û Kurdistanê ve hatiye amadekirin, ji weşanên Nûbiharê derket.

Sekreterê Komeleya Dostaniya Japonya û Kurdistanê Vakkas Çolak ji Rûdawê re ragihand, dema ku li Japonyayê dijiya, dîtiye ku li ser zimanê Kurdî ti xebatek tine ye û fikra amadekirina ferhengê hatiye bîra wî.

Vakkas Çolak dibêje: “Min li Japonyayê di warê zimanê Kurdî de tenê du pirtûk dîtin. Yek ji wan, pirtûkeke rêziman a bi zaravayê Soranî ku ji aliyê akademîsyekî zimanê Farisî ve bi devoka Kirmaşanê hatiye nivîsandin. Ya duyem jî, ferhengêk bû ku ji zimanê Erebî hatibû wergerandin, ew ferheng di sala 1980î de tenê carek hatiye çapkirin û niha li bazarê tine ye.”

Li zanîgehên Japonyayê daxwaza zimanê Kurdî

Çolak diyar kir ku li zanîgehên Japonyayê weke derseke hilbijartî perwerdeya zimanê Kurdî tê xwestin, lê ji ber ku mamoste û pirtûkên perwerdehiyê tine ne ev yek pêk nayê û got:

“Bi taybetî li Zanîngeha Zimanên Biyanî ya Tokyoyê daxwazeke bi vî rengî heye. Berî niha li zanîgehên Takushoku, Osaka û Kyoto jî daxwaza perwerdeya zimanê Kurdî hebû, lê ji ber van sedeman ti car pêk nehat.”



Li ser xebata ferhenga Japonî – Kurdî jî Vakkas Çolak destnîşan kir: “Ev xebata ferhenga pîrziman, berî niha ji aliyê Nûbiharê ve weke Kurdî (Zazakî-Kurmancî-Soranî), Tirkî, Farisî û Îngilîzî hatibû çapkirin. Min jî ligel hevalan, beşên Tirkî û Farisî derxistin, bi alfabeya Japonî û Latînî û herwiha kurtasiya rêzimana Kurdî ya bi zimanê Îngilîzî ya Baran Rizgar

jî lê zêde kir û me da ber çapê.”

Çolak eşkere kir ku ew dixwazin li Zanîngeha Selahaddin a li Hewlêrê kurseke zimanê Japonî vekin, lê ji ber pirsgerêkên siyasî û aborî nekarrîne vê daxwaza xwe bi cih bînin û got: “Pirtûka ku em niha amade dikin, di asta akademîk de dê bibe yekem pirtûka rêzimana Kurdî ya bi zimanê Japonî. Herwiha me bi zaravayê Soranî pirtûkeke axaftina rojane amade kiriye ku têde ferhengok jî heye. Armanca me ew e ku em vê xebata xwe, piştî ku hinekî din jî li ser bixebitin, di meha Nîsanê de derbixin.”

Vakkas Çolak niha zimanê Kurdî fêrî 14 Japonan dike ku yek ji wan roj-namevan, du jî mamoste ne û herwiha beşdarî xebatên siyasî, civakî û çandî yên navbera Kurdistan û Japonyayê dibe. Rûdaw

Zimanê Kurdî

Qursên Kurdî, A. Karabax

Ma qey fîl tevî wê laşgirsiya xwe jî bextiyar in? Siltanê Fîlan bi xwe jî ne bextiyar e. Helwêsta ku dê gêrîkan bextiyar bike ew e ku divê gêrîk ji bo Siltanê fîlan bi canfedayî bixebitin, bixebitin û dîsa bixebitin û ji bo Fîlistanê, canê xwe fedayî birayên xwe yên gêrîk bikin. Wan, ji tiştên ku gêrîkan ji bo fîlan û Siltên dikirin, bê rawestan her nimûne didan. Belê, gêrîk dê bûbûna fîl jî, ji xwe ew fîlên lanetlêhatî bûn. Her gêrîk ji berê de fîlek bû, lê lanet li wan hatiye û wiha wek gêrîkan hatine piçûk-kirin. Her gêrîk bi xebatê û bi destûra Siltên dikare bibe fîlek. Belê, bi destûra Siltên... Siltan dikare fîlîtiyê bide her gêrîkê jêhatî. Gêrîk dikarin bi destûra Siltên bibin fîl. Lê ew dikarin bi tenê, bi qasî gêrîkan bibin fîl. (Siltanê Fîlan, Y. Kemal)

Ev peyv hoker in : Ne, bextiyar, qey, bi canfedayî, dîsa, bê, belê, berê, wiha, bi xebatê, bi tenê, bi qasî ...

Qursên Kurdî, A. Karabax

1A) Beşên Hokeran :

Hoker, li gor çawanî û erkên xwe li pênc beşên bingeîn dabeş dibin :

1. Hokerên çawaniyê(çawanî, wesfîn) :

a. Piraniya peyvên van ji rengdêrên wesfîn pêk tên. Ji aliyê peyvsaziyê ve ev, bi giştî bêguhartin bikar tên û çawaniyên çalakiyan didin nasîn.

b. Bo kifşkirina peyvên wan, pirsên bi (çawa/çawan, çilo/çiton, çi, hwd) li lêkerên pêveberî tên kirin.

Ji hokerên çawaniyê : Dereng, zû, tenê, bi tenê, bi misogerî, bêşik, te-qez, bêguman, tavi, edîbane, evdalkî, hêdî hêdî, lez, bi lez, wirane, hwd.

a. Ji wan ên ku bi alikariya daçekê(bi) çêbûne : Bi lez, bi misogerî, bi tenê.

b. Ji rengdêrên çawaniyê yên bingeîn : Bilind, biçûk, mezin, xweşik, hwd.

Mînak 515 : Hokerên çawaniyê : Çend bikaranîn :

a. Gulçîn hêdî hêdî dimeşiya. b. Rojda û Nalîn bi lez dimeşiya.

c. Niha ev keç bi tenê dixebite. ç. Gul û Gulçîn xweşik dikenin.

Tiştonek



A: Mahir Berwarî

- Rêwiyekî reqî rinyaw e, le lêwî lêr û lêr e warekî, rêwî lo lêrî delûrî, lêrr lo rêwî delûrî.

- Sed derzî du sed derzî, be kunî derzî daykim da bezî.

- Sirk e sîrî betatî, xarim dayê be satî, sirkem xuward sil becêma.

- Sê sebetê be awê da hatin, yek gû, yek mû, yek tû, le gûy bezîm, le mûy bezîm, tûy de-gezîm, qepim da le gû, çingim da le mû, leqim da le tû.

- Şaxu gir û gundûr, têrr sipiya kujî sîr, yêx ker, yêx cil, yêx cilhûr.

- Şeş teşt miz-aş, mişt miz-aş.

- Şeş mirîşk im hene, sêy sipî popît e reş, sêy reşî popît e sipî.

- Şeş sîşe li sere şeş serşûka şûştin.

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

Xwendevanên hêja!
Hûn dikarin bersiva
tiştonekan bi riya E-Maila
Agiri2003@gmail.com ji
me re bişînin



Agirî

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (320)

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Wêneyên merasima bidawîhatina dewreya 228 a destpêkî a pêşmerge-Hêza Taybet

